"Eskeran mêr beravkirin navenda gund û ji wir birin gundê Arezdeyanê. Li wir bi wan ra civîn kirin û gotin: "Em ji we re 3-4 roj west didin, dewleta Tirkîyeyê dixweze êrîşî ser dewleta Sovyetê bike, li sînora şerê bibe, ji bona wê jî em we ji sînora dîr dixin." Dîroka Kurdan dîrokeke pir kevnar e. Ew di nava zilm, zorê de, bûyerên dijwar de derbas bûye û gîhiştîye rojên me yên îro. Ez dixwazim behsa wan bûyera yekê bikim ku sala 1937'an pêk hatibû. Ewa 78 sala ku Kurd ji Qafqasyayê hatine nefkirin û ew şandin Qazakîstanê. Sala 1937'a "bavê gel" Î.V. Stalîn Kurd nefkirin. Nenêrin ku 78 sal ji nefkirinê derbas bûye, hê jî çave geleka li rîya dê û bavê xwe, bira û xûşkê xwe ye ku wan bibînin. Bi sedan Kurd, Azerî, Ermenî, di rîyan de, di sir û sermê de, ji birçîbûnan mirin. Sala 1937'an ji Qafqasyayê bi emrê Stalîn sirgûnî Qazakîstanê û Asyaya Navîn kirin, wek "gelê bêtîbar". Wî wextî ji navçeya Şerûrê, Naxçivan a Azerbaycanê nezîkî cemê Erez 12 gundê Kurdan: Qîçaç, Qerka, Misirka, Axayar, Qerebûrin, Yanix, Golevan, Metîqa-Şawalîka û yên din sirgûn kirin. Payîz bû Kurd hê jî çîyan nû hatibûne aranê, amadekariyên zivistanê dikirin.

Rêwitiya bi trêne dest pê dike

12'ê Mijdarê sibe zû bû, wesaitên bargir eskerên Sovyetê jê peya bûn û dora gund girtin. Bore-bora çêleka, ewtîniya seyan, qurte-qurta mirîşkan, girînya zara, bi gilîkîva bû qerebalix. Eskeran mêr li qada gund kom kirin û ew birin gundê Arezdeyanê û li wir wana ra civîn kirin û gotin: "Em ji we re 3-4 roj west didin, dewleta Tirkîyeyê dixweza êrîşî dewleta Sovyetê bike, li sînora wê şer bibe, ji bo wê jî em we ji sînora dîr dixin."

Kurdê belengaz bi nîvqîmet pêzê xwe firotin Azerîyan. Îzin dane wan ku hesp û dewarê xwe bi xwera bibin. Piştî 2-3 rojan wesaitên bar hatin, 3-4 mal bar kirin, berê wan dane stasyona Arazdayanê. Mal barkirin vagonê bargir, vagona de tiwalet tunebûn, di kuncê vagonê de, vagon qul kiribûn, perdeke tede darda kiribûn, çawa tiwalet! Qîz, bûkan ji kal û pîra, xesû û xezûra şerm dikirin herine tiwaletê, ber wê jî wan nan, av nedixwarin. Wexta stasyonê trêne disekinî ew peya dibûn, diçûne tiwaletê. Wexta stasyonê elam dikir ku tirênê here Kurda zimanê Rûsî nizanibûn, hinek ketine bin tekerê tirênê seqet bûn.

Sirgûna - Nefkirina Kurdên Qazakîstanê

'Em mirovên çiya ne!'

Nezî meheke ew rê hatin, trêna wan gîhişte bajarê Almatayê, ji wir bi wesaitên bargir, di sir û sermê de ew birine navçeya Balxaşê gundê Baxti-Baxtîye. Serokê gund ew parevekirine ser malê Qazaxan, her yekê re otaxek dan, ew hetanî baharê ser wan man. Qazaxan ew bi nan, av û cil kirin. Baharê dewletê ji wana rê xanî çekirin, ew ketine xaniya, xwe re erd reşandin. Bû havîn dest germe û mixmixka (mêşa) wan taw nedikir. Hineka ber wê dijwariye xwe şewitandin. Şevêkê rûspiyê gund beravî mala sedre kolxozê Keremê Lele bûn û giliyê xwe kirine yek, şev seat yekê barkin. Wan bi şevê boholên xwe yi ker, hespan kirin û berê xwe dane çemê Îliyê. Kêleka çemê Îliyê meşîyan. Bi sibe ra, Qazax deriyê malên Kurda vedikin, lê dinêrin ku mal vala ne, pez, dewar, hesp û kuçikê wan tunenin. Cimeata gund cawê didine navçeyê, esker bi hespa ve dikevin pey şopa wan, lê dinêrin ku 15 km li kêleka çemê Îliyê ew westiyayî dibin. Wî çaxî esker dora wan digirin û dixwezînin wan vegerebin cihê wan. Cem wan kalek hebû navê wî Biro bû ew jina re dibêje xwe bavêjine çem. Ew xwe davêjine çem û dikine qîje-qîj. Esker tene cem mêra û dipirsin, kî zimanê Rûsî zane. Biro tene cem wan divêbe ez zimanê Rûsî zanim. Esker divêjine Biro, ev jinan çî dixwazin, ew dibêje eger hûn pêşîya me bernedin, emê xwe çem de bixeniqînin, em meriyê çîyan e, em

canê, hinek jî li herema Almatayê man. Piştî hilweşîna dewleta Sovyetê sala 1990-1991'ê Kurd ji Ermenîstanê ji bo na şere Qereba xa Çiya hatine Qazakîstanê. Naha ewana li Qazaxistana jiyana xwe didomînin.

Birine pêş eniya şer de

Bi dewr û zemana Kurd ketine mirin, kuştinê û nefkirinê. Dijmin û neyarê Kurdan her tim xebitîne da ku Kurdan ji çî warê wan bibin, wan bihelînin û asîmîle bikin. Merî dikare behsa wan bûyera yekê bike ew jî nefkirina Kurda ya sala 1941'ye. Sala 1941'ê şerê cihanê dest pê kir. Wî wextî bi emrê Î.V. Stalîn gelê kêmnetew nedibirine şer, Gurcîstanê Kurdê Axîske pasaportê wan guherînin, wan de Azerî nivîsîn û birine pêş eniya şer. Li gundan de ciwan, kal-pîr, jin û zarok man. Sala 1944 meha mijdarê ji navçeya Aspîndizînsike ji gundê Axçiyê, Coldê, Timogviyê, Zêdevarziyê, Mîrîşxanê, Danêtê, Anakêtê û yên mayînan nefkirine Qazakîstanê. Kurdên van gunda di nava 3-4 rojê de malê wan barkirine irênên bargir de berê wan dane best û beyarêd Sovyetîstanê. Kurdan nizanbûn ku wan dibine kû. Trêne de di rê de kal û pîr, jin û zar ji sermê, seqemê, birçîbûnê mirin. 20 roja tirên di rê de hat û gîhişte herêma Almatayê. Ewana birine navçeya Çîlikê. Qazaxan di sermê û seqemê de alîkarî dane Kurdan ew nan, av, mal û kinç kirin.

Bi ordên û madalyava vedigerin

Malxîyê wan mala birine şer em dikarin



nikarin li çol û qumîstanê de bijîn! Wî çaxî îzîn ji navçê tene pêşîya wan vedikin. Di nava du roja de ew tene Almatê. Hinekan ji wan dişînin navçeya Îliyê, yên din ji dişînin navçeya Enbekşiyê. Yê navçeya Îliyê tene Kayçûk Sovxozê. Ewana nezîkî çemê Almatînka biçûn 25 kulîkê binerd çêdikin. Alîkî kulîkêda sewalan xwedî dikin, yê din de jî ew dimînin. Kurdên nefkiri hetanî sala 1948'a wan kulîka de dimînin, dû wê re Sovxoz erdê dide wan ew ji xwe re xaniya çê dikin. Wê demê îzina nefkiriya tunebû 2 km dûrî gund herin, lazîm bû ku ji komendat (qomtan) îzin bixwestana. Îzina wan tunebûn ku herin xwendina bilind dest bînin. Pey mirina Î. V. Stalîn sala 1956'an de îzin dane nefkiriyan ku ji ku hatine dikarin herin cihê xwe. Wê demê hinek ji wan vejeriyan Ermenîstanê û Azerbay-

navê çend kesa bikşînin Zîyo Aliyev, Aydin Aliyev, Ezalxan Mistevayev, Adil Hesenov, Sarî Aslanov, Meclîs Hesenov û yên mayînan. Ji wan gundan 25 kes çûbûne şer ji wan heft kesan bi ordên û madalyava vejeriyan. Ji wana wek mînak ez dikarim bidime kîvşê Aydin Aliyev ku şer vedigere, tene Gurcîstanê gundê xwe li dinere pêş mala wî mirovne biyanî hene. ij wan dipirse "Hûn kî ne?" ew dibêjin, "Ev mala me ye", dewletê daye me. Aydin diçe cem muxtarê gund û jê re dibêje, "Ka malbata min?" Muxtar dibêje: "Malbata te nefkirine Asyaya Nvîn!" Aydin bi çetînayî tene Ozbekîstanê bajarê Taşkentê li wir dipirse ku malbata wî kû da nefî kirine. Ew hîn dibe ku malbata wî nefkirine Qazakîstanê. Ew tene bajarê Almatayê bazara Almatayeye li wir jineke Azerî dibêjê ku, malbata wî li gundê Zariya-Vostokê ye, ew

te li wir maîdate xwe didine.

Çand û hunera "Berbang"

Sala 1986'an serokkomarê dewleta Sovyetê eye Sosîalîtê dawî M.S. Gorbaçov di nava dewletan de dabêşkirin da meşandinê. Di heman demê de partiya mîletperest serê xwe bilind kirin. Di nava komarên Sovyetê de şer û pevçûnan des pê kirin. Mirov hatin qirkirin û ji cih û warê xwe bûn. Wî çaxî bi emrê Dewleta Sovyetê ji bo na her netewê û kêmnetewekî navendên çand û hunerê hatin sazînin. Li Qazakîstanê cara yekemîn sala 1989'an li bajarê Almatayê Navenda Çanda Kurd hat sazînin. Dû wê re sala 1993'an li Qazakîstanê Navenda Çanda Kurdên Qazakîstanê "Yekbûn" hat sazînin. Tevlî wê navendê herêma Almatayê, Çîmkendê, Cambûlê û Taldîqorxanê (yi wir gelek Kurd dijîn) bûn. Sala 1999'an navê navendê hate guherandinê û mîna "Berbang" ve hate binavkirin.

Azerî, Îranî û Tirk hatine nivîsandin

Ji sala 1989'an hetanî sala 1998'an serokê navenda çand û hunera bajarê Almatayê Huseynê Hemîd Sadîkov bû. Ji sala 1991 hetanî sala 1996'an serokê Yekîtiya Kurdên Qazakîstanê "Yekbûn" Ezîzê Zîyo Bedîrxan xebitiye. Ji sala 1996'a hetanî sala 1997'a Kînyazê Îbrahîm xebitiye. Ji sala 1998'an hetanî 2006'an akadêmîsyen Nadîr Nadîrov, ji sala 2006'an hetanî niha akadêmîsyen Kînyazî Îbrahîm kar dike. Bi agahiyên resmî li Qazakîstanêda 45 heza Kurd dijîn. E texmîna Yekîtiya Kurdên Qazakîstanêye "Berbang" 100 hezarî zêdetir Kurd dijîn. Di pasaportên wan de Azerî, Îranî û Tirk hatine nivîsandin. Ewana hîn jî li herêma Almatayê, Cambûlê, Axmolê, Çîmkendê dimînin.

Weşanên 'Jiyana Kurd' û 'Nûbar'


Yekîtiya Kurdên Qazakîstanê ya çand û hunera "Berbang" kar û xebatê çandî hûnerî û civakî ve mijûl dibe. Ji sala 1991'ê hetanî niha li bajarê Almatayê rojnema "Jiyana Kurd" (berê navê wê Kurdîstan bû weşanê dike. Rêdaktorê rojname Hesenê Hecîsilîman e. Ji sala 1992'a hetanî niha kovara "Nûbar" weşanê dike. Rêdaktorê wê akadêmîk Kînyazê Îbrahîme. Yekîtiya Kurdên Qazakîstanêye "Berbang" çand û hunerê usa jî berhemên nivîskar û helbestvanan çap dike. Niha li Qazakîstanê 17 komê folklorê û reqasê hene. Pêş Assam blêya Gelê Qazakîstanê ji sala 2001'ê hetanî niha komên dersên zimanê Kurd hatine teşkîlîkirin. Di wan komê de dersê zimanê Kurdî Hesenê Hecîsilîman dide.

Cara yekemîn dewlet finanse kir

Di Qazakîstanê de cara yekemîn Yekîtiya Kurdê Qazakîstanê "Berbang" çand û hunerê hesabe (finasê) dewletê ve sala 1996'a elfeba û giramêra zimanê Kurd da weşanê. Torîvanê kitêbê Kînyazî Îbrahîm e. Mûzeya dewletê ya mezin de sala 1995'a para çanda Kurda hatiye vekirinê. Kurdên Qazakîstanê di nava pêdaçûyîna komarê de ji aliyê çand, huner, ilmî, perwerdê de û aborî de keda xwe tevlî kirine. Kurdên Qazakîstanê her tim welatê xwe Kurdîstanê û gel xwe re ye. Eş û jana Kurd û Kurdîstanê eş û jana wan e!

YENÎ ÖZGÜR POLİTİKA

50 SAL DI SER KOÇKIRINA HELBESTVAN QEDRÎ CAN RE DERBAS DIBE



Îro, (09.08.2015), 50 sal di ser koçkirina helbestvan Qedrî Can



re derbas dibe, bi min xweş e ku ez vê diyaloga helbestî di navbera

wî û Apo Osman Sebrî de ji we re raxînim ber çavan. Di 15ê gulana 1932an de, dema ku mîr Celadet Bedîrxan kovara xwe HAWARÊ li Şamê çap û belav dikir, Qedrî Canê yê yekemîn bû ji bilî wî û birayî wî Dr. Kamîran Bedîrxan, ku kovara Hawarê bi berhemên xwe dixemiland.. Û di encam de bi navê nûxuriyê Hawarê hat naskirin.. Hingê ev helbesta wî ya bi navê: Hawarê hebe gazî li dîyê (Ji bo birayê min Osman Sebrî) di hejmara Hawarê a pêşî de belav kir, tede berê xwe daye Osman

Sebrî dibêje:

*Jiyîn çiqas delal e
Di nêv bav û biran de
Dil heyê ko ne nale
Ber birînên rîman da
Ev birîna rîman e,
Barekî pîr giran e,
Kezeb, gurçik ne mane,
Li pepûkên xwehan da.
Hawara me vava ye
Xewa bê kêr bela ye
Qet şik tede ne ma ye
Di gotînen yaran da..*

Osman Sebrî jî yê duyemîn e ku di kovara Hawarê de dinivîsandiye. Wî jî ev helbest (Berdêlik; Ji Qedrî Canê Canbi-

ra re), wek bersiv ji Qedrî Can re, di hejmara 2an de ji kovara Hawarê belav kiriye:

*Jiyîn xweşe bi xurtî
Li Kurdistan bi Kurdan
Bav û biran; çî bikim?
Hemû min tê bi dîrdan..
De rabin li me tu zanî
Rim nîne gîş nizanî
Xopan kirin Kurdanî
Ev teral û nezanan
Hawarê, xweş awakir
Dilê Kurdan pê şakir
Zar û zîman ava kir
Jîn û xweşî belav kir..*

Konê Reş
Qamişlo

Ji Ermenistanê heta Kazakistanê axîneke ji kezebê

“Ez Kinyazê Îbrahîmê Nevoyê Mîrze. Wekî Kinyazê Îbrahîm Mîrzojev jî tême naskirin. 1-ê Gulana 1947-an, li Zengîbasara Ermenistanê hatime dinyayê. Ev der li ser Çemê Eresê ye û nêzikî sînore Tirkîye ye. Navê Gundê me Rihanlû ye. Malbata me ji Serhedê ye. Em ji Eşîra Celaliyan in. Kal-bavê min ji Rojhilatê Kurdistanê hatine Bazîdê, ji wir jî li Îdirê bi cih û war bûne.”



Prof. Dr. Kinyazê Îbrahîm, rojhilatnas û akademîsyen. Serokê Kurdên Kazakistanê û li Zanîngeha Abaya Alma Atayê Serokê Navenda Zimanên Dinyayê. Piştî Şerê Qerebaxê terka Ermenistanê dike û di destpêka sala 1990-î de li Alma Ataya Kazakistanê bi cih dibe. Li Erîvanê, li Zanîngeha Xaçatûr Abovyan salên dirêj Serokatiya Beşê Ziman û Edebiyata Azeriyan kiriye. Vê gavê Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kazakistanê û Endamê Yekîtiya Rojnamegerên Kazakistanê ye. Li hêla din ew Li Kazakistan û Asya Navîn Nûnerê Navenda PEN'a Kurd e û Berpîrsê Giştî yê kovara edebî Nûbarê ye ku li Alma Atayê bi zimanê Kurdî û rûsî ronahiyê dibîne. Kinyazê Îbrahîm xwediyê gelek xelatên neteweyî ye. Bi 6 zimanan dizane. Nêzikî 20 kitêb li pirtûkxaneyê Kurdî zêde kiriye. ‘Xortê 67 salî’ xwediyê serpêhatîyeke balkêş e. Di 65 salan de, bûye şahidê gelek qewimînan, guhdariya karesatên mezin kiriye. Ji dayikê û nefîkirina yekem destpê dike: “Dayika min malxanî Mihemedê Nadojev Ūso ye. Ji Eşîra Birûkan e. Li Wanê hatiye dinyayê. Di sala 1926-an te bi qasî 2000 malan malbata me jî dersînor dibe, dikeve nav axa Nexçivana Sovyeta Berê. Wê gavê gelek eşîrên me kurdan ji ber serhildanên Agirî, Şerê Bro Heskê Têlî, Şêx Seîd xwe li sînoran dixistin û ji ber zilma roma reş terkeser dibûn. Rehmetiyê bavê min digot ku ew ji eşîra Bro Heskê Têlî yê Celalî ne. Gel bi halekî perîşan hatiye sirgunkirin. Parek çûye Îranê. Em ji wan eşîran bûne ku 1926-ê salê derbasî axa Sovyetê bûne. Gelek eşîrê kurdan para xwe ji nefiyê standine. Brûkî, Celalî, Sîpkî. Lê zêdetirê wan Brûkî bûne. Heta sala 1937’an li wir mane. Piştî ku derbasî hêla din a Eresê dibin, li aliyê din ji malbata wan gelek kes dimînin. Artêşa Sor a Sovyetê rê li ber wan digire. Êdî nahêle derbas bin. Sînore tê şidandin. Berê di navbera Tirkîye, Sovyet û Ermenistanê de sînore tunebûn. Havînê kurd ji wir dihatin zozanên Egrîce, Qanîgol, Qizilziyaretê. Heta payîza dereng li wir diman. Payîzê dizivîrin Serhedê. Gava ku birek ji eşîrên kurdan li wan zozanan bûne, leşkerên Sovyetê hatine û gotine; ‘Êdî hûn nikarin derbasî hêla din a Eresê bibin!’ Milet

perîşan dibe...”

Kinyazê Îbrahîm piştî vê rewşê behsa malbetekê dike ku serî jî vê yekê re rakiriye û tevî kuştina mêran û leşkeran sînore derbas kiriye: “Çend mal hene, ji Mala Basoyê Ozmên ku Mamkî ne. Şerê dikin sînore derbas dikin. Xwe li Çemê Eresê dixin, digihîjin qewim, bira û pîsmamên xwe. Di navbera wan û leşkerên Sovyetê de şer çêdibe. 2-3 kes ji wan, ji leşkerên Ūris jî çend leşker tene kuştin. Piştî wî şerî, Sovyet sînore girê dide. Hinceteke din jî ew bû ku divê kurd ji wir derketana. Digotin; ‘kurdên li nav sînoren Azerbaycan, Tirkîye û Ermenistanê karê îstîxbarat û ajantiyê dikin.’ Desthilatdarên Ermenistan û Azerbaycanê jî dixwestin kurd ji wir derkevin. Armanca wan ‘paqijkirina’ kurdan, yekmiletbûna wan bû.” 1937’ê salê, di nava şevêkê de kurdan li trênen bar û heywanan siwar dikin, di bin kontrola leşkeran de nefî dikin. Kes nizane bi ku ve jî dibin. Du mehên dirêj di rîyan de ‘dê weledê xwe davêje!’ Gava dibînin ku li Kazakistan û li ser hidûdên Kirgîzistanê ne. Sar, seqem, çol, best. Ne ew der bi zimanên wan dizanin, ne ew bi zimanên wan deran!

“Malbata me jî di nav wan de ne. Dê, bav, xwişk-bira, kal-pîr, qewim û pîsmam. Malbata me li Kirgîzistanê wîlayeta Qizilqeyayê peya dikin. Ew der nêzikî Oşê ye. Oş li ser sînore Ozbekistanê ye! Kurdên Ermenistanê tînin Kirgîzistanê. Kurdên Azerbaycan û Nexçivanê tînin Kazakistanê. Malbata me sê salan li Qizilqeyayê dimîne. Heta sala 1940’î.” Sê sal paşê destpêka Şerê Cihanê yê Duyem e. Camêrek heye, ji wan re dibe dergeh û star! Stara vegera Erîvanê. Ew camêr rewşenbîr, şair û nivîskarê mezin Wezîrê Cebare Nadîrî ye. Kinyazê Îbrahîm bi van hevokan behsa wan rojan dike:

“Di nav nefîkiriyan de malbata Wezîrê Nadîrî jî hebûye. Ew jî hatine sirgunkirin. Wezîrê Nadîrî tê malbata xwe dibe. Dewletê ji bo malbata me digot;



“Ev kesên biguman in. Dikarin ajantiyê bikin.’ Lê Wezîrê Nadîrî ketibû karê dewletê. Di îstîxbarata dewletê de nav û dengê wî hebû. Rê jê re vekirî bû. Digot; ‘Ez kefilê vê malbatê me.’ Hat û malbata xwe bir. Mala me jî tevî mala wan, 1940’ê salê zivirî Erîvanê. Li Erîvanê jî bo 10 malan avahî standin, erd standin. 1941’ê salê mala me derbasî Zengîbasarê dibe, li gundê Rûhanliyê cîwar dibe. Wê salê birayê min ji dayikê dibe, navê wî Têmir e û niha 70 salî ye. Xwişk û birayekî min jî li Kirgîzistanê dimirin: Yaqûb û Gulnaz. Dê-bavê min bi du zarokan ve tînin Kirgîzistanê, destvala dizivîrin Ermenistanê! Her du jî 2-3 salî bûne. Di wan zilm û çetinahiyan de dimirin. Lewma jî dê û bavê min her dem digotin; ‘Me du zarok bi xwe re anîn vir, lê em destvala zivîrin.’ Ji dê û bavê min

re 9 zarok çêbûn. 7 bira, 2 xwişk: Têmir, Yaqûb, Gulnaz, Ez, Eylaz, Eywaz, Ehmed, Nûrê û Mihemed. Em destpêka 1990’î ji Erîvana Ermenistanê hatin Alma Ataya Kazakistanê. Birayê min Yaqûb 4-5 mehan li Alma Atayê ma û li vir rehma Xwedê kir.” Kinyazê Îbrahîm di sala 1955’an de dest bi dibistanê dike û heta 1963’yê salê li gund dixwîne. 1963’yê salê tevî zarokên rehmetiyê xalê xwe Balayê Nadîr li Erîvanê dest bi dibistana navîn dike. Bala birayê Wezîrê Nadîrî ye. Navê dibistana wan Axundov bû. Dibistan li ser navê Azeriyan bû. 65-66’ê salê dibistan diqedîne û diçe Fakûlteya Ziman û Dîrokê ya Zanîngeha Bakûyê. Doktoraya xwe jî li wir dike. 1978-ê salê teza xwe ya doktorayê dinivîse. Teza wî li ser ‘Têkiliya Edebiyata Kurdan û Azeriyan’ e: “Min di teza xwe de behsa edebiyata me ya bedew xal bi xal nivîsandiye. Edebiyata çar perçeyên welatê me tê de heye. Min edebiyata me û ya Azeriyan daye ber hev. Li gorî vê tezê em dibînin ku gelek rewşenbîr û nivîs-



karên mezin ên Azeriyan, li ser edebiyata kurdan nivîsandine. Di nav wan de gelek kes jî hene ku kurd in. Mesela nivîskarê Azeriyan ê mezin Nîzamî Gencewî dinivîse ku dayika wî Kurd e. Nîzamî ‘qerasesekî edebiyata dinyayê’ ye. Wî bixwe ‘Xemse’ nivîsandiye. Xemse ji pênc berhemên mezin pê. Leyla û Mecnûn, Xosrov û Şêrîn 2 ji wan in. Her wiha wî Îskendername nivîsandiye. Nîzamî di berhema xwe ya Leyla û Mecnûnê de dibêje ‘dayika min kurd e û navê wê Reîse ye. Min terbiya xwe ji malxalanê xwe yê kurd dîtiye.’ Gava dayika wî dimire gelek xemgîn dibe. Li ser dayika xwe nivîsandiye, me kiriye kurdî. Lê bi Azerkî dibêje: ‘Kürt kizî anamdır/Bizi Terg ettî/Bîr ana kalbîne dünyadan gittî/Ne geder yansa da, yaksa da ürek/Anama dil vèren var midir görek?’ Dibêje; ‘Kürt Kizi Anam/Diya min a keça kurd.’ Jixwe dayika wî ji bajarê Gencê, ji Êla Şedadiyan bûye. Nîzamî li tu deverî nanivîse; ‘bavê min faris e, an Azerî ye an tirk e.’ Naxwe bavê wî jî kurd e.”

Prof. Kinyazê Îbrahîm diyar dike ku mînakên wisa gelek in, di zargotina Azeriyan de gelek motîfên kurdan hene û berdewam dike: “Yek ji wan ‘Destana Koroglı’ ye. Koroglı bi kurdî jî hatiye gotin. Koroglı kurdekî Celalî ye. Têkiliya kurd û Azeriyan di tarîxê de xurt e. Zimanê Azeriyan bi ser tirkî ve ye, lê ew ne tirk in, arî ne. Kurd jî arî û medyayî ne. Îranî jî wisa ne. Li Rojhilat, li Îranê Azerî di nav kurdan de mezin bûne. Rabûn-rûniştin, xwarin, adetên wan gelek nêzikî hev in. Kurdan nêzikî xwe dîtine. Mesela gelek şair û nivîskarên

Azeriyan li ser Komara Mehebad, Qazî Mihemed û Pêşmergeyên Barzanî nivîsandine. Min di teza xwe de behsa van têkiliyan jî kiriye.”

1989-1990, Şerê Qerebaxê. Azerî û Ermenî hev dixwin! Kinyazê Îbrahîm dibêje ku şer mala kurdan jî mîrat kiriye: “Kurdên me –xasma jî kurdên me yê misilman- rastî eş û azareke mezin hatin. Ji neçarî li seranserê Sovyetê belav bûn. Hinek ji wan çûn Sîbîrya û Yaqûtskê, beşek ji wan çûn Rûsya û derdora wê, qismek ji wan hatin Kazakistan, Qirgîzistan û Ozbekistanê. Ev nefîkirin ne wekî nefîkirina 1937’an û 1944’an bû. Ermenî bi darê zorê digotin; ‘ji nav me derkevin herin. Ermenistan axa Ermeniyana e!’ Di dema Sovyetê de ji bavê kî zêde bû wisa bigota? Sovyet çavê wan derdixist!”

Kinyazê Îbrahîm dibêje ku ev polîtîkaya dewleta Ermenistanê bû, dixwestin kurdên misilman û kurdên Êzîdî ji hev cuda bikin û ev polîtîka îro jî berdewam e: “Digotin; ‘Êzîdî ne kurd in!’ Ji ber

ku digotin; ‘Em kurd in’, kirin ku gelek rewşenbîr, zimanzan, nivîskarên kurdên me yê Êzîdî terka Ermenistanê bikin. Dewletê bi rîya şêx û pîrên Êzîdîyan zilm û neheqî li wan kir. Semendê Siyabend, Şekirovê Xudo Mihoyî, Karlanê Çaçan, Mîroyê Esed, Çerkezê Reş, Tîtalê Efo, Şerêfê Eşîr, Celîlê Celîl, Ordîxanê Celîl. Tevahiya van navan digotin; ‘Em Kurd in’, lê Ermeniyana şêx û pîran sor dikirin ku li dijî wan bikin şer. Dikarin jî. Digotin; ‘We miletê xwe firotiye!’ Bi ser de jî li Karlanê Çaçan û Çerkezê Reş xistibûn. Ez bixwe li wir bûm. Ev lîstika Ermeniyana bû. Dixwestin tifaqa kurdan perçe bikin. Ermenî niha tiştekî wiha xistine nav Êzîdîyan me. Ji wan re dibêjin; ‘Nebêjin zimanê me Kurdî ye, bibêjin Êzîdî ye’ Radyoya Kurdî heye. Radyo vekirin bi navê Radyoya Êzîdîyan nemeşiya, rojname derxistin nemeşiya. Nameşe jî! Gava digotin; ‘Zimanê me Êzîdî ye’ jî bi Kurdî digotin! Ez bixwe 43 salan di nav kurdên me yê Êzîdî de mame. Piraniya heval û hogirên min Kurdên Êzîdî bûne. 43 salan min negotiye; ‘tu Êzîdî yî’ wan negotiye ‘tu misilman î.’ Em diçûne malên hev, me nanê hev dixwar. Kurdayetî îro behrek e. Di wê behrê de Êzîdî jî, zaza jî, Goran jî, Soran jî, Behdînî jî di hûndirê wê behrê de ne. Gelo tu dikarî ji behrê, ava çeman cuda bikî? Nikarî! Tu sax û ez silamet...”

* Di hejmara 140-î ya rojnameya Rûdawê Çapa Ewropayê ku li Kolnê tê weşandin de bi sernavê “Ji Erîvana Ermenistanê berbi Alma Ataya Qazaxistanê: Çîroka sirgunkirina malbata Serokê Kurdên Qazaxistanê Kinyazê Îbrahîm” hatiye weşandin.

Salihê Kevirbiri
salihkeviri@hotmail.com

Qamişlo ... bi rêzdarî Salvegera Prof. Dr. Kinyaz Ibrahim Mîrzoyêv himbêz dike



Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriya duhî di roja yekşemî 7ê Tebaxê de, li bajarê Qamişlo "Hola Osman Sebrî" ya "Partiya Yekîtiya Kurdistan -Sûriya", bi rêzdarî simînarek bi boneya yekemîn salvegera koça dawiyê ya Prof. Dr. Kinyaz Ibrahim Mîrzoyêv, bi amadebûna hejmarek ji nivîskar û rojnamevanan û bi beşdariya malbata xwedêjêrazî bi rêya online lidar xist.

Di destpêkê de, birêz Ebdulsemmed Mehmûd û xanim Şemis Enter bixêrhatina mêvanan kirin û paşî belgefilmek li ser jiyana xwedêjêrazî Prof. Kinyaz Ibrahim Mîrzoyêv peyva birêz Nayîf Cibîro cêgirê serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriya hatin pêşkêşkirin, û bi rêya online peyva malbatê ji aliyê birêz Wezîr Kinyaz Mîrzoyêv "Qazaxistan", peyva birêz Şêx Remezhan Seîdov Serokê Federasyona Navneteweyî ya Diyasporaya kurdên Sovyeta berê (FNDK) "Qerxîzistan, Dr. Barî Mehmûd "Elmaniya", birêz Memoyê Memo rêveberê Federasy-

ona Komelên kurdên Diyasporaya Navneteweyî "Rûsya", birêz nivîskar û rojnamevan Hejar Şamil kurê Şamil Askerov yekem Serokomarê Kurdistanê Sor, birêz nivîskar û rojnamevan Tahir Silêman sernivîserê Heftînameya Diplomat ya kurdên Azerbajjan, birêz nivîskar û rojnamevan Salih Kevirbirî "Bakurê Kurdistan" û birêz helbestvan xanim Gohar Memo ji kurdên Ermenistanê û nivîskar Ebdûlazîz Qasim ve hatin pêşkêşkirin.

Kurtiyek li ser jiyana xwedêjêrazî Prof. Dr. Kinyaz Ibrahim Mîrzoyêv

(01.05.1947- 08.08.2021)

- Di sala 1947an de li Ermenistanê jidayîk bûye.

- Di sala 1970î de, bi astekî bilind dektora filolojiyê ji zankoya Xaçatûr Abovyan ya Ermenistan wergirtiye.

- Di salên heftêyî û heştêyî yên sedsala borî de, bûye serokê Fakulteya Ziman û Edebiyata Azerî li Zanîngeha Yêrêvanê.

- Di sala 1990î de li zanîngeha Almatayê serokatiya Beşa Filolo-

jiya Rojhilatî kiriye.

- Serokê Beşa Zimanên Navneteweyî li Zanîngeha Almatayê.

- Endamê Lijneya Akademiyên Qazaxistanê bû.

- Endamê lîse û enstîtuyên (Parîs, Berlîn, Bruksel û hwd.)

- Li (Almata, Moskova, Petersburg, Bakû, Yêrêvan, Tiflîs, Parîs, Berlîn, Amsterdam, Bruksel û Stenbolê) beşdarî konferansên teyorkî, zanistî bûye.

- Serokê Komela Kurdên Qazaxistanê - Berbang -

- Serokê Federasyona navnetewî ya Komelên kurdên Sovyeta berê (FNDK).

- Sernivîskarê Kovara Nûbar - Mijarên Wêjeyî

- Di sala 2010 de serokê Komara Qazaxistanê ew bi madalyaya zêrîn xelat kir.

- Di sala 2013an de bûye cîgirê serokê Komara Qazaxistanê.

- Gelek caran serdana Herêma Kurdistanê kiriye

- Bi dehan pertûkên hene, ji wan:

- dîroka tîkiliyên edebî yên azerî-kurdî

- Çavkaniyên dîrokî yên edebiyata kurdî

- Ansîklopediya Kurdan.

- Adetên netewî, girêdanên edebî û hwd

Mixabin di roja Yekşemî 08.08.2021ê de, li bajarê Almata yê Qazaxistanê di jiyê 74 saliya xwe de koça dawiyê kir û li goristana kurdan li Almata hat veşartin.

Komîteya çalakîyên Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê Sûriya Qamişlo 08.08.2022

Nêçîrvan Barzanî pêşwazî li Konsulê Giştî yê Almanayê kir

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî îro Yekşema 7.8.2022 pêşwaziya Konsulê Giştî yê Almanayê li Herêma Kurdis-



tanê Clemens Zemtner kir. Di hevdîtinê de Serok Nêçîrvan Barzanî spasiya hewlên Konsulê Giştî yê Almanayê ji bo pêşxistina tîkiliyên li gel Herêma Kurdistanê kir û hêviya serkeftinê di erkê wî yê nû de xwest. Ji aliyê xwe ve Konsulê Giştî yê Almanayê kêfxweşiya xwe ji bo karkirina li Herêma Kurdistanê nîşan da û spasiya hevkarî û piştevaniya aliyên peywendîdar kir ku pêşkeşî wî kirine di kar û çalakîyên wî de, herwiha rol û hewlên Serok Nêçîrvan Barzanî ji bo komkirina aliyên siyasî yên Kurdistanê bilind nixand.

Herdu aliyên herwiha peywendiyên Herêma Kurdistanê li gel Almanya, proseya siyasî ya Iraqê, rewşa Şingalê û çend mijarên din gotûbêj kirin.

KDP.info

Amerikayê endametiya Swêd û Finlandiya ya NATOyê pejirand

Serokê Amerikayê Joe Biden protokola endabûna Finlanda û Swêdê ya ku bibin endamê NATOyê îmze kir. Biden got: Bi ketina we ya NATOyê hevpeymanîya NATOyê bi hêztir dike.



de pesend kir û ragihand: "Em bi rêya berfirehkirinê ve, hevpeymanîya NATOyê bihêztir dikin." Amerika endametiya Swêd û Finlandiya ya ketina NATOyê pesend kir. Serokê Amerikayê di vê derbarê de daxûyaniyek da medyayê û got: Deriyê NATOyê ji bo hemû welatên xwedî mercên endabûnê ne, vekirî ye. Swêd û Finlanda xwedî hêz in û mercên endabûna NATOyê di wan de hene, hêza NATOyê û pabendbûna Amerikayê û hevpeymanîyê de ji berê bihêztir e. Beriya ku ziyar bigihîje me, em rûbirûyî metirsîyan dibin, em ligel hevpeymanên xwe nexşeya siberojê amade dikin. Berdewamiya daxûyaniya xwe de Biden got: Em ê îsal çend gavan ji bo bihêzkirina welatê xwe biavêjin û rûbirûyî her destdirêjî û gefên dijîminkarane bibin. Em ligel hevpeymanên xwe xeta berevaniya rojhilatê NATOyê bihêztir dikin û em dikarin li Ewropayê li hember astengiyên nû li ber xwe bidin.

Kobanî: Polîsê serbazî yê Rûsyayê gera xwe ya bi Tirkîyê re betal kir

Li Kobanî ya Rojavayê Kurdistanê polîsê serbazî yê Rûsyayê gera xwe ya bi hêzên Tirkîyê re betal kir



ku dê îro Duşemê bihata kirin. Li gor çavkaniyên Rêveberiya Xweser, li Kobanî polîsê serbazî yê Rûsya gera xwe bi hêzên Tirkîyê re betal kir ku divabû îro Duşemê bihata kirin û hêzên Rûsyayê bi 2 helikopteran li rojavayê Kobanî gera xwe kirin. Duşema borî jî, polîsê serbazî yê Rûsya gera xwe ya hevbeş a bi hêzên Tirkîyê re li rojhilatê Kobaniyê betal kiribû.

Heta nîha hêzên Rûsyayê û Tirkîyê li Kobaniyê 108 gerên hevbeş kirine.

Rûdaw

Li Iraqê tevlihevî berdewame..!



Li Iraqê çikas diçe aliyên siyasî dijberiya hev dikin û tiştê ku dixweyê rêya diyalogê niha girîtiye. Wek tê zanîn aliyekî Tevgera Sedir ji liyek din jî Tevgera Çerçoveya Hemahengiyê heye. Herdu alî jî Şîene û Çerçova Hemahengiyê girêdayê Îranê siyasî dîke û Sedir berevaciye Îranê ye.

Piştî parlementerên tevgera Sedir xwe ji parlamentoyê vekişandin û alîgirên Sedir dest xwepêşandana kirin û ketin nava herêma Kesk û li parlamentoyê de dest grev a rûniştinê kirin, niha jî alîgirên Çerçoveya hemahengiyê dest xwepêşandana kirin û di herêma Kesk de dest greva rûniştinê kirin.

Di heman demê de Çerçoveya Hevahengiyê ji partiyên Kurdistanî xwest ku li ser berbîjêre seroko-

mariyê biryarê bidin.

Çarçoveya Hevahengiyê dibêje: "Em bang li partiyên siyasî yên Kurd dikin ku bi lez berbîjêre serokomariyê diyar bikin û berbîjêre fraksiyona herî mezin ji bo serokwezîrtiyê destnîşan bikin."

Roja Înê piştî nimêjê Tevgera Sedr, Çarçoveya Hevahengiyê û rêxistinên sîvîl 3 xwepêşandanên cuda li Bexdayê saz kirin.


Alîgirên Sedr ev nêzî du hefteyan e li Herêma Kesk çalakiya rûniştinê li dar tîxin.

Rêberê olî û siyasî yê Şîa Sedr di 3ê Tebaxê de bi daxûyaniyekê banga hilweşandina parlamentoyê û lidarxistina hilbijartinên pêşwext kir.

Sadr ev bangawazî careke din dubare kir, vê carê jî xwest dadgeh mudaxele bike û parlamentoyê hilweşîne. Sedr bang li alîgirên xwe jî kir û xwest ku piştî temamkirin û îmzekirina formên daxwazên ku ji bo hilweşandina parlamentoyê, radeştî dadgehê kirin.

Li aliyê din Serokwezîrê berê û yek ji serokên Çarçoveya Hevahengiyê Nûrî Malikî li hember daxwaza Sedir daxûyaniyek da û dibêje: Ne hilbijartinên pêşwext, ne guhertina rejîm û ne jî destûr dê were guhertin û biryara van tenê di parlamentoyê de ye. Parlamento ji ber çalakiya rûniştinê ya alîgirên Sedir nikare bicive. rojvakurd.com

Hevpeymaniya Fetih: Tenê Barzanî dikare xitimandina siyasî bidawî bîne



Serkirdeyê Hevpeymaniya Fetih a Iraqê Ayd Hilalî, bal kişand ser serdana Serokê Hevpeymaniya Fetih Hadî Amîrî ku doh 14ê Tebaxê li Hewlêrê bi Serok

Mesûd Barzanî re civiyabû û got: "Barzanî 'kesê tenê ye' ku dikare dawî li xitimandina proseya siyasî li Iraqê werîne."

Serkirdeyê Hevpeymaniya Fetih Ayd Hilalî ji rojnamevanên Iraqê re daye xuyakirin: "Destpêxeriyên Barzanî dikarin dawî li kêşeya ku ev nêzîkî salekê ye ji ber encamên hilibjartinên parlamentoya Iraqê derketiye holê bîne."

Hilalî destnîşan kiriye: "Barzanî dikare rola navbeynkariyê bilîze ji bo bidawîna kêşeyên di navbera aliyên siyasî de, bi taybetî yên navbera Şîeyan û ev jî dibe sedema ku dawî li kêşeya siyasî ya Iraqê were." Serkirdeyê Hevpeymaniya Fetih li ser hevdîtina Serok Barzanî û Hadî Amîrî jî gotiye: "Hevdîtina Mesûd Barzanî û Hadî Amîrî ji bo hewldanên Serok Barzanî yên ser bidawîkirina xitimandina proseya siyasî ya Iraqê bû."

PeyamaKurd

Alîkariya Holanda ji bo hêzên pêşmerge berdewam e

Li gor daxuyaniya Wezaretê Pêşmerge, Serokerkan Îsa Uzêr li gel Şêwirmendê Serbazî yê Holanda yê li Herêma Kurdistanê û Şêwirmendê Siyasî yê li Konsulxaneyê Holadayê ya li Hewlêrê civiyan. Di civînê de li ser birêveçûna proseya çaksaziyê ya li



rêzên hêzên Pêşmergeyê Kurdistanê û rola şêwirmendên Holadayê hat sekinandin.

Serokerkan Îsa Uzêr jî bo havkariya Holanda spasîya erk û karên şêwirmendên Holadayê kir.

Serokerkanê Kurdistanê da xuyakirin ku, ji aliyê fermandariyê ve, kontrolkirin û damezrandina du firqeyên serbazî ji bo hêzên Pêşmerge, şêwirmendên hevpeymanan rola wan heye.

Di civînê de behsa serdana şanda Wezaretê Pêşmerge bo welatên Brîtanya û Amerîkayê hat kirin, civîn û hevdîtîna şanda wezaretê ligel fermandarên serbazî yên herdu welatan hatin gotûbêj kirin û bi girîng hatin dîtin. Herwiha rola Brîtanya, Amerîka û Holadayê di alîkarîkirina hêzên Pêşmerge de bilind hat nixandîn.

rojvakurd.com

Kolberekî Kurd ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve hat kuştin

Kolberekî Kurd ê ji bajarê Selas a Bawecanî ya Kirmaşan a Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve hat kuştin.

Li gor zanyariyan, do Înê dema hejmareke kolber ji sînorê Şêx Sîle re derbas dibûn, Hêzên Îranê gule bera wan dan û kolberê bi navê Mihemed Nadiîrî yê 18 salî ku xelkê Selas a Bawecaniyê ye can da. Herwiha hat ragihandin, di dema vegeera ji Başûrê Kurdistanê de, gule bera kolberan dane.

PeyamaKurd

Komeleya Şêx Seîd sibe dozê li Umît Ozdag vedike

Piştî gotinên sivikatiya li Rêberê Kurd Şêx Seîd yê Serokê Partiya Zafer Umît Ozdag ku nijadperestiya tirkîtiyê dike, Komeleya Şêx Seîd û Hevalên wî dozê lê vedike. Ozdag li ser Twitterê li ser parvekirinên parêzerê Kurd Sidkî Zîlan, heqaret û sivikati li Şêx Seîd Efendî kiribû ku gelek bertek jê re hatin nîşandan.

Serokê Komeleya Şêx Seîd û Hevalên wî Kasim Firat got ku ew dê li dijî Serokê Giştî yê Partiya Zaferê Umît Ozdag ku sivikati li Şêx Seîd kiriye, li dadgehê gilî bikin.

Li gorî nûçeya Rûdawê Kasim Firatê nêviyê Şêx Seîd gotiye, ew dê giliyê Umît Ozdag li dadgehê bikin û ew bi rêveber û parêzerên komeleyê re, li ser vê rewşê axivîne û dê sibe 16ê Tebaxê jî ligel Baroya Amedê li dijî Ozdag giliyên xwe tomar bikin.



Firat got: "Em nizanin çima wiha diaxive. Mêş biçûk e, lê mehdê mirov li hev dixê. Lê em dê li ser rêya xwe berdewam bin."

Herwiha Kasi Firat, li ser hesabê xwe yê twitterê jî bersiva Ozdag dabû û gotibû: "Behr bi devê kûçikan naheime."

Kesên ku zimandirêjiyê û heqaretê li Şêx Seîd Efendî dikin, divê bizanibin em qet ji zalimên zordar û hevkarên wan netirsiyan, serî netewand. Şêx Seîd Efendî rûmeta gelê Kurd û bawermendan e. Ez bawer im ku ew ê bersiva pêwîstê bidin faşîstên dijûnker."

PeyamaKurd

Dixwazin statuya koletiyê ya kurdan bidomînin!

Daxuyanî û hewldanên 'lihevanîna opozîsyon û rejîma Sûriyê' piştî 11 salên şerê xwînî yê Sûriyê, niha babeta sereke ya rojevê ye. Tirkîyê bi eşkereyî ev daxwaz ji opozîsyona Sûriyê ya nêzîkî xwe kir û ev jî bû sedema nerazîbûn û protestoyan li wan herêmên artêşa Tirkîyê tê de biçih bûye.

Piştî Zîrweya Soçî ya Erdogan û Pûtîn ku 5ê Tebaxa 2022yan pêk hat, lihevanîna opozîsyon û Şamê derket pêş. Diyar dibû ku Pûtîn di wê mijarê de Erdogan razî kiribû û digot, wê piştî hevdîtîna li herêmê guhertinên mezin çêbibin.

Hemû bijardeyên çareseriyê pûç derketin!

Piştî şer û aloziyên 11 salan li Sûriyê, hewldanên 'lihevanîna opozîsyon û rejîmê' ku herdu aliyên gelekî xwîna hev rijandine, nîşan dide ku êdî hemû bijardeyên çareseriyê yên Rûsya, Îran û Tirkîyê pûç derketine û nebûne derman ji birînên gelê Sûriyê re. Rûsya, Îran û Tirkîyê çendî caran di civînên Astana yê qaşo 'garantoren çareserîkirina krîza Sûriyê' de tene cem hev, lê ji sala 2017an ve ti encameke ku civaka navdewletî û gelê Sûriyê pê razî bikin jî dernexistine holê.

Derbederbûna bi milyonan kesan ne xema wan e...

Ev her 3 welat ji çareseriyê zêdetir berjewendiyên xwe esas digrin. Dixwazin berjewendiyên wan ên li herêmê werin misogerîkirin û derbederbûna bi milyonan însanan jî ne xema wan

seriyên' nû.

Çi ne ev çareseriyên nû? Navê wê danîna "Lihevanîna opozîsyon û rejîma BAAS"

Rûsya bi vê lîstokê dixwaze hebûna xwe ya li Sûriyê û bi tay-

xirabtir dike. Ev lîstok dibe sedema şer û cepheyên nû bi xwe re vedike...

4 milyon penaberên Sûrî ku li IDLIBê dijîn, naxwazin careka din bibin êsîrê rejîma Esed.

herêma Suriyê ye. Li herêmên di bin destê Esed, Rûsya, Îran û Tirkîyê de; kaos, anarşîzm, talan, kûştin û mafyagerî hakim.

Niha Rûsya û Tirkîyê dixwazin wê herêma aram jî têk bidin.

Dikarin yan jî nikarin ev babateke cuda ye û em ê bibînin. Li vir helwesta Rûsya û Tirkîyê ya li hember Kurdan careke din zelal dibe.

Ew Rûsya bû ku Komara Kurdistanê ya Mahabadê bi lihevkerîna enerjîyê firotibû. Ew Rûsya bû ku bi lihevkerîna peymanî bergiriyê re ligel Saddam Hisên şerê Şoreşa Îlonê kir û Peymana 11 Adarê bînpê kir. Niha jî dixwaze ji bo berjewendiyên xwe bi Şam û Ankarayê re statuya Rojavayê Kurdistanê bînpê bike.

Ew Tirkîyeyê ku bi sedan sal in bi çîrokên biratiyê Kurdan dixapîne, amade ye bi dijîmîne xwe yê herî mezin Esed re lihev bike, tene ji bo pêşîgirtina Kurdan.

Ew Tirkîyeyê ku edebîyata biratiya Tirk û Kurdan dike, bi hevalbendîya hêzên wek El Qaidê ku ji DAIŞê tene, mala Kurdan wêran dike.

Rewş careke din ji Kurdan re nîşan dide ku divê êdî dev ji çîrokên 'Biratiya Gelan û Yekîtiya Umetê' berdin û vegerin ser rastiya xwe...



Ji bo Rûsya mayîna li Derya Spî ji giyanên bi sed hezaran însanan û derbederbûna bi milyonan xelkê Sûriyê girîngtir e.

Dîsa ji bo Tirkîyê û Îranê jî berdewamkirina 'statuya koletiyê ya li ser Kurdan' ji her tiştî girîngtir e. Ev helwesta wan bibe sedema îflasa dewleta wan jî jê venagerin.

Lê belê niha ew siyaseta wan a li ser Kurdan ferz dikin, xitimî ye. Ji ber ku ev siyaseta wan xitimî ye jî niha ketine pey 'çare-

bet jî li Derya Spî û berdewamiya rejîma Şamê misoger bike.

Tirkîyê jî dixwaze bi vê lîstokê pêşîya lihevhatina rejîmê û Kurdan bigire daku nîzama berê ya bê statu hiştina Kurdan berdewam bike.

Yanî bi hewldanên bi navê 'lihevanîna opozîsyon û rejîmê' dixwaze bi rejîma Sûriyê re li hev bike û bi hev re careke din mala Kurdan wêran bikin.

Lê belê diyar e ku Îran li derveyê vî lîstoka nû maye;

Ji niha ve eşkere dibe ku ev lîstok rewşa Sûriyê baştir nake,

4 milyon penaberên Sûrî ku li Tirkîyê dijîn naxwazin careke din bibin êsîrê rejîma Esed.

4 milyon Kurd û Ereben ku li Rojavayê Kurdistanê dijîn jî naxwazin careke din bibin êsîrê rejîma Esed.

Dixwazin statuya li Rojavayê Kurdistanê bi hev re hilweşînin...

Tirkîyê weke ku sond xwariye, dixwaze bi sedem û hincet nîşandana hebûna PKKê, statuya ku li Rojavayê Kurdistanê pêk hatiye hilweşîne.

Rojavayê Kurdistanê kî îdare dike ferq nake, lê niha aramtirîn

13 Tebaxê li Goryaçiy Klyûçê şahiyek ji bo 158 saliya avabûnê vê bajarî hate derbazkirin



Diasporayê Kurda di vê merasîmê de bi serkêşiyê Serokê Kurdên Herêma Goryaçiy Klyûçê Mehmedê Hemîd Mamêdov çand û hunerê gelê Kurd bi şanazî û li gorî pêwitiyê temsîl kirin.

Di qada şahiyê de pêşangehên Kurdî hatibû danîn. Tê da huner, xwarin û pirtûkên Kurdî hate destnîşankirin. Di merasîmê de helbestvan û serokê komeleya "Keskesor" a Herêma Krasnodarê Dursun Balayêv ji bo niştêcîhên Goryaçiy Klyûçê helbesta xwe pêşkeş kir. Nivîskar Hejarê Şamil, pirtûka xwe ya bi navê "Kurdên Diaspora" («Курдская Диаспора в станах СНГ») diyarî serokatîyê herêma kir.

Serokê herêmê Goryaçiy Klyûçê Sergêy Vîktorovîç Bêlopol-skîy bi çand û hunerê Kurda re pir eleqedar bû, derheqa Kurdan pirsên curbêcur da.

Bi taybetî stran û govendên Kurdî bala gelhe û mêvanên Goryaçiy Klyûçê kşand.

Goryaçiy Klyûçê li Rûsya yê, eyaletê Krasnodarê herêmek e. Li vir du hezar Kurd dijîn.

Serok Barzanî pêşwaziya Serokê Hevpeymaniya Siyade kir

Li Selaheddîn Serok Barzanî pêşwaziya birêz Xemîs Xencer Serokê Hevpeymaniya Siyade kir.



Li hevdiînê de her du aliyên di derbarê guhertin û pêşhatên dawî yê li nav proseya siyasiya Iraqê de danustandina bîr û raman kirin û tekez li ser hemahengî û karê hevbeşiya di navbera wan ya ji bo derbasbûna ji wê girêya siyasî kirin.

Her li vê hevdiînê de di derbarê bi qeyrana siyasiya Iraqê de, her du alî wê yekê dîpat kirin ku her destpêşxerî û hengaveke nû pêwîste bi rêya baştirkirina rewşa siyasî ya li Iraqê û dawî hatina qeyrana siyasî bê.

Di derbarê hîlbijartina pêşwext ya Encûmena Nûneran her du alî li ser ewe hevrebûn ku encamdana hîlbijartina pêşwexte hengaveke başe bi mercek ku hemû aliyek pêgirî bi encamên wê bikin.

rojvakurd.com

Ji bo serdana gora 'Mem û Zînê' ji Çînê hatin Cizîrê

Bûk û zavayekî Çînî ji bo serdana gora 'Mem û Zîn' a berhema navdar a Ehmedê Xanî bikin, ji Çînê bi rê ketin û hatin Cizîra Botan a Bakurê Kurdistanê.

Neng Dong e û 5 sal berê bûye Misilman û navê xwe wek Nûredîn guhertiye û bi keçeke Siûdiyê bi navê Yumna zewicî re ye.



Bûka ji Erebistana Siûdî û zavayê Çînê ku di bin bandora çîroka Mem û Zîn a Ehmedê Xanî de mane, ji Şanghay a Çînê hatin Cizîrê û serdana gora 'Mem û Zînê' kirin. Hat zanîn ku zava akademîsyenekî Çînî bi navê

Nûredîn, piştî ku di lêkolînê xwe yê akademîk de filozof û alimê Kurd Ehmedê Xanî û berhema wî ya navdar "Mem û Zîn" nas dike, gelekî bandorê li ser çêdike û evîna xwe ya ligel Yumnayê jî dişibîne ya Mem û

Zînê. Hat zanîn ku Nuredîn ji bo pîrozkirina yekemîn salvegera zewaca xwe ji bajarê Shanghay ê Çînê ji 7 hezar kilometre dûr bi rê ketiye û hatiye serdana gora Mem û Zînê li Cizîra Botan.

Yumnayê li ser vê serdanê gotiye, ji bo wan îro rojê girîng e, lewra ev yekemîn salvegera zewaca wan e.

Zavayê Çînî li Akademiya Zanistên Civakî ya Shangayê dixebite, biryar daye Mem û Zîna ku beriya niha ji bo bi dehan zimanan hatibû wergerandin, wergerîne Çînî û du sal in li ser berhemê dixebite.

Neng Dongê ku du rojan li mala Cizîriyan bûye mêvan dibêje; "Ez doktor akademîsyen Nûredîn. Ez li ser wergerên edebî kar dikim. Min Mem û Zîna ku orjînalê wê bi Kurdî ye, ji tekstên Îngilîzî, Fransî û Tirkî wergerand Çînî. Min xwest beyt bi beyt wateya wê ya orjînal biparêzim."

Bolton: Îran gefeke mezin e û divê helwesta Washingtonê li dijî Tehranê bihêztir be

Şêwirmendê berê yê Asayîşa Netewî ya Amerîkayê John Bolton di hevpeyvîke bi K24 re diyar kiriye û gotiye: Ji ber "piştewaniyên wê yê



bo terorê" Îran gefeke mezin e û divê helwesta Washingtonê li dijî Tehranê bihêztir be.

John Bolton di hevpeyvîna xwe de, li ser gefên Îranê û bernamaya wê ya atomî eşkere kiriye, heta ku li Îranê hikûmeteke nû çênebe, ev kêşe çareser nabe. Bolton li ser mijara bernamaya atomî ya Îranê jî destnîşan kiriye, Îranê tu cûre biryareke stratejîk ji bo lipeyçûna çekê atomî nedaye, desthilatdarên Îranê dixwazin dorpêçên aborî yê li ser wan werin rakirin. Herwiha Bolton ne di wê baweriyê de ye ku Îran dest ji çekê atomî berde û gotiye: "Îran gefeke mezin e, ne tenê ji ber bernamaya atomî, ji ber 'piştewaniyên xwe yê bo terorê' û divê helwesta Washingtonê li dijî Tehranê bihêztir be."

Di berdewamiyê de şêwirmendê berê yê Asayîşa Netewî ya Amerîkayê li ser vekîşîna Amerîkayê ji rêkeftina atomî ya ligel Îranê diyar kiriye: "Ez bawer im tiştêkî rast bû ku em xwe vekîşînin û dorpêçan bixin ser Îranê."

John Bolton li ser guherîna hikûmeta Îranê jî eşkere kiriye: "Amerîka lipeyçûnê ji bo guherandina rejîma Îranê nekir. Diviyabû bikira, heta ku hikûmeteke nû li Îranê çênebe, ev kêşe çareser nabe, hikûmeteke ku nûnertiya xelkê Îranê bike, ne nûnertiya Ayetullahan." Hêjayî gotinê ye, John Robert Bolton 73 salî, parêzer, dîplomatar, şêwirmendê Komariyan û şîrovekarê siyasî ye. Ji sala 2005 heta 2006an wek 25emîn Balyozê Amerîka yê li Neteweyên Yekbûyî kar kiriye, herwiha ji sala 2018 heta 2019an wek 26emîn Şêwirmendê Asayîşa Netewî ya Amerîkayê xebitiye.

PeyamaKurd

Daxwaza çarenivîsa girtiyên destê DAIŞê tê kirin

Li bajarokê Ebû Hemam ê Dêrazorê daxwaza eşkerekirina çarenivîsa girtiyên di destê DAIŞê de hate kirin.

Komeleya Şehîdên Eşîreta Şîetata ya Dêrazorê, di çalakiyekê de daxwaza eşkerekirina çarenivîsa kesên ku ji sala 2014an ve ji aliyê DAIŞê ve hatine girtin, kirin.

Di çalakiyê de wêneyên girtiyan hatin rakirin, di nav wêneyan de wêneyê peyamnêrê Rûdawê Ferhad Hemo jî heye.

Roja 15-12-2014an, çekdarên DAIŞê peyamnêrê Rûdawê Ferhad Hemo li ser rêya Qamişlo û Til Koçer revandibûn, heta niha çarenivîsa wî ne diyar e. Di tebaxa sala 2014an DAIŞê li rojhilatê



Dêrazorê bi sedan endamên eşîreta Şîetata kuştin û heta niha jî bi dehan kes ji wê eşîretê wendayî ne.

Rûdaw

PDK li ser rewşa aloz a Iraqê: Pêngavên cîdî, pêwîst û bilez bavêjin

Polîtbiroya PDKê li ser rewşa aloz a Iraqê, destpêşxeriyekî nû belav kir û diyar kir: "Pêngavên cîdî, pêwîst û bilez bavêjin."

Daxuyaniya Polîtbiroya PDKê wiha ye:

Derbarê rewş û aloziyên siyasî yên wê dawiyê li Iraqê de, PDKê nerazîbûn û nerehetiya xwe ya li hember vê rewş û tengzariya siyasî ya Iraqê nîşan dide. Eşkera ye ku her di destpêka ragihandina encamên hilbijartinên Iraqê yên meha Cotmeha sala 2021ê de pêk hatin û ew pirsgerêk û alozî û pêşketinên piştî hilbijartinê bûn asteng li pêş damezrandina hikûmeta nû ya Iraqê ya li ser bingeha destûrî ya bawerî pê hatî û li ser bingeha sîstema siyasî ya niha ya Iraqê û di encamê de welat gihîşt rewşeke siyasî ya daxistî.

Bi dîtina hestpêkirina berpirsyartiya bilind û ji bo berjewendiyên welat û ji bo parastina Iraqê ji wan metirsiyên ku di qonaxa niha de rast hatine,



em daxwazê ji hemû rêveberên siyasî yên li qada Iraqê ne dikin ku di asta berpirsyartiya qonaxa niha de bin û daxwaz li hemû aliyên dikin pêngavên cîdî, pêwîst û bilez bavêjin, ku gotûbêjên bi berhem û serkeftî li ser bingehê destûra Iraqê encam bidin û ji bo rizgarkirina welat ji vê rewşa çeqî ya niha derbikeve. Ji bo wê jî, ji bo encamdana proseya çaksazî û guhertinên rasteqîn û başkirina rewşa niha ya Iraqê, dikare rêkeftinek bê kirin li ser encamdana hilbijartinên pêşwext, piştî ku hemû alî rêkeftin û soza wê yekê jî bidin ku wê bi encamên dawî yên hilbijartinan, wê wekî xwe razî bibin û ezmûnên hilbijartinên berê yên Iraqê jî bi wî awayî dubare nabe.

PeyamaKurd

Bazên Zagrosê êrîşê bingehê leşkerî yê rejîma Îranê kirin

Malpera "Bazên Zagrosê" belav kiriye ku, di bajaroka "Dizê" ya girêdayî devera "Mirgower" a ser bi bajarê Urmîyê, êrîşê binkeyeke rejîma Îranê hatiye kirin. Malper di derbarê vê çalakiyê



de dibêje: "Di şeva Pêncşemî 19'ê gelawêj a sala 1401'an a Rojî, Bazên Zagrosê li bajaroka Dizê ya ser bi devera Mirgower êrîşkirine li ser "pasgaha Qezayî ya Mirgower" ya hêza serkutker a Komara Îslamiya Îranê.

Fermande û kirêgirtiyên di vê binkeya rejîmê de, rola bingehîn di azardana xelkê "Dizê" û deverê de hene. Ev binkeya rejîmê bi sedema cihê taybetî yê cografî û pêkhatiya siyasî û civakiya bajaroka "Dizê" ya ser bi devera Mirgower" her ji destpêka şoreşa Îslamî ve, girîngiyek taybet pê hatiye dan û bi berdwamî hêzên bê rehim û kurdîjî tê de cihgîr kirine.

Di vê hewla "Bazên Zagrosê" de çekdarên rejîmê, bi qasekî tirsiyane ku heta sibêdehê nekarîn, ji binkeya xwe derkevin. Ew hewla "Bazên Zagrosê" dilxweşbûna xelkê Dizê û deverê li pey xwe aniye.

PeyamaKurd

Hiqûqa Serok Barzanî: Hiqûqa Pêwendiyên Beşên Kurdistanê û Partiyên Kurdistanê, Dijitiya PKKê...



Ibrahim GUÇLU
(ibrahimguclu21@gmail.com)

Lê PKKê xwe di ser hemû rêxistinên Kurdistanê re dibîne û ji hemû rêxistinên Kurdistanê re dijminî dîke. Ji bona ku wan tasfiye bike xebat û êrîş dîke. Dixwaze ku mala hemû kurdan Dewleta Federe ya Kurdistanê têk bibe û xirab bike.

Hiqûqa di navbera rêxistinên Kurdistanê û hemû beşên Kurdistanê de, mijareke gelek girîng û stratejîk e. Hezar mixabin hemû kurd, rêxistinên Kurdistanê û siyasîvanên kurdperwer di vê mijarê de him nezan in, him jî tevliheviyek heye. Loma jî di pêwendiyên rêxistinên Kurdistanê û hemû beşên Kurdistanê şaşiyên mezin pêk tên.

Hîç şik tune ye ku ev mijara ji bona avabûna hiqûqa demokratîk ya Kurdistanê jî gelek girîng e. Yanî ev hiqûqa, di heman dem de dibe sedem ku li Kurdistanê hiqûqeke civakî û demokratîk jî ava bibe; an hiqûqeke demokratîk û civakî ava nebe.

RÊXISTINÊN KURDISTANÊ DIVÊ JI HIQÛQA HEVÛDÛ RE RÊZDAR BIN Û DI AVAKIRINA HIQÛQA DEMOKRATÎK YA WELÊT DE ÇÊKER BIN...

Kurd, netewe ye û netewe ye kevn e. Neteweya kurd jî li beşek erdnîgara Rojhilata Navîn cîwar bûye. Welatê kurdan jî, Kurdistan e. Welatên kurdan Kurdistan, ji derveyî îradeya wan bi îradeya derve, erdnîgaran wan, welatên wan bi destê Împaratoriyan dagirker û kolonyalist hat parçe kirin. Kurdistan, di sala 1639an de encama Peymana Qesrî Şêrînê di navbeyna Împaratoriya Osmanî û Farsî de bû du beş.

Parçebûna Kurdistanê li wir jî nesekinî, Piştî Şerê 1-emîn Ya Dinyayê encama Peymana Lozanê bi destê dewletên mezin yên emperyalîst û dewletên kolonyalist yên herêmî, bû çar parçe.

Parçebûna Kurdistanê, neteweya kurd jî parçe kir. Parçebûna netaweya kurd, parçebûna jiyana wê ya civakî, siyasî, aborî, eşîretî, erdnîgarî, aqil jî parçe kir.

Loma jî kurdan, ji hevûdu dûr jiyaneke domandin. Di bin dagirkerî û kolonyalîzma dewletên cûda de jiyaneke cûda ya rêxistinî jî, pêşve birin. Di heman dem de ev yek bû sedem ku hêjayiyên milî yên neteweya kurd qereker û qalibekî din qezenç bike.

Ev parçebûna Kurdistanê bû sedam, ku li tevayî Kurdistanê tevgera neteweyî ya hevbeş jî ava

nebe. Li her beşekî Kurdistanê tevgera cûda ya neteweyî ava bû û hat rêxistin. Li her parçeyê Kurdistanê serokên cûda yên milî çêbûn. Li her parçeyê Kurdistanê rêxistin û partiyên cûda ava bûn.

